

**PEYMANA BÊDENGÎYÊ
Û ÊŞA KESÊN NE JI ME;
RENGVEDANA JINÊN
ERMENÎYAN DI ZÛRA
YA FELAT DILGEŞ Û
BAVFILE A M. ALÎ. K. DE***

*Fahmkirin ji bibîranînê girîngtir e,
her çiqas ji bo fahmkirinê, pêdivî bi bibîranînê hebe jî.*

Susan Sontag

Destpêk

Êş û karesatên li erdnîgarîya me rû daye, reh û rîçalên xwe berdane binê erdê me, rastîya ku ji me ye bi awayekî binerdî, bi me re heta îro hatîye û bîra me ya hevpar bi tevlîbûna xwe ve, bi bibîranîna qewimînên cihêreng ve ava kirîye. Edebîyata me jî bivê-nevê ji bîra me avê vedixwe, bi wê geş dibe ji pir alîyan ve xwe dispêre tecrube, şahidî, malwêranî, trawmaya fîzîkî û psîkolojîk a vê bîrê; carina wan ji bo vebêja xwe dike babeta sereke û di avakirina karakter û mekanê de ji wan sûtê werdigire. Vebêjên li ser qewimandinên trawmatîk ne tenê alîkarîya me dikin ku em çîroka kesekî guhdar bikin û jê tiştinan beşer bikin, lê di heman demê de

* Ji bo pêşnîyaz û rênîşanderîya wî ez spasîyên xwe pêşkêşî kekê Dawid Yeşîlmen dikim.

qadekê vedike ku çîrok û serpêhatîyên takekesan tê de tîn vegotin. Bi vî karî, bîra cîvakî derfetê dide vebêjê ku bi rêya serpêhatîyên takekesî vê bîrê binimîne û li ser rabirdûya ku carina bîra me dike ku bibîrneyne, bibîranîneke ku di navbera nîfşên me de danûstandinekê pêk tîne, ava bike. Laurie Vickroy, di berhema xwe ya bi navê *Trauma and Survival in Contemporary Fiction*ê (Trawma û Xelasî di Çîroksazîya Modern de) amaje pê dike ku “govanîya li rabirdûyê ji bo gelek nivîskarên peywire-ke muhim e, çimkî ew hewl didin ku serpêhatîyên takekesî û hevpar ji windabûn, tahde û şîroveyên xelet xelas bikin.”¹

Di edebîyata kurdî de –çi zazakî çî ji kurmancî- hejmara roman û kurteçîrokên ku komkujîya ermenîyan ji xwe re kirine babet, piştî salên 2000an bi awayekî berçav zêde bûne.² Lêhûrbûna li ser vê babetê ya nivîskarên kurd terçîheke tabîi ye. Çimkî hem xebatên li ser bîra civakî³ û hem jî xebatên li ser rengvedana komkujîya ermenîyan di folklorê kurdî⁴ de nîşanî me didin ku ev babet berî ku were qada edebîyatê di hafizeya civakê de ji aliyê vegotinên devkî û kilaman⁵ ve cihekî berfireh girtîye. Di vê babetê de dengvedan û hilberîna edebî di heman wextê de wezîfeya pîrekî dide li ser milên xwe ya ku dixwaze berdehamîya vegotinên devkî temsîl bike û ji bo neqilkirin û beyankirina rastîya civakî qadeke honakî peyda bike da ku serpêhatîyên ji bavûkalan mane, neyên jibîrkin. Ev jibîrnekirin an jî bibîranîn deynê rabirdûya me ye, ku daye dema me ya nika; dema me ya nika bi vegotinên derheqê dema borî ve xwe bi rabirdûyê ve dibestîne û berdehamîya danûstandina di navdêra do û îro de xurt dike, dîrokê dikemilîne.

Hevrûbûna bi bûyerên sala 1915an re pêk tê, di çîrokên nivîskarên kurd de dibe meseleyeke wijdanî. Ev helwest, nerazîbûna li hember nêrîna kevneşopî ya ku nivîskar bi koka xwe ve pê girêdayî ye, destnîşan dike. Di heman demê de, vegotinên devkî yên ku di bîra hevpar de cih girtine li ser berhemên nivîskarên kartêker e. Vegotinên ku bi rêya şahidîya

1 Laurie Vickroy, *Trauma and Survival in Contemporary Fiction*, Virginia: The University of Virginia Press, 2002, r.1.

2 Adnan Çelik, “Hafîza Rejiminde yeni bir alan: 1915, Kürtler ve edebiyat”, *Kovara Birikimê*, h.27, sal.2015, r.29.

3 Bnr. Adnan Çelik, Namîk Kemal Dinç, *Yüz Yıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Dîyarbekir*, İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları, 2015.

4 Bnr: Rohat Alakom, *1915 Komkujîya Ermenîyan*, Stembol, weş. Avesta, 2005.

5 Şikra min ji “kilaman” ev in; *Kilama Gundê Cano*, kilama *Bavo Ferman e* û kilama *Gulê û Hecî Musa Beg*. Bi taybetî jî ya *Gulê û Hecî Musa Beg* ji Serhedê heta Botanê di nav kurdan de pir berbelav e. Min bi xwe jî guhertoyeke vê kilamê ji devê dengbêjekî ji gundê Zengê ya ku bi Licê ve girêdayî ye, tomar kir.

şahidîyê ve hatine bidestxistin, ji gotinên devkî ber bi edebîyata şahidîyê bi rê dikevin. Di vî warî de, Beatriz Sarlo dema behsa vegotina tecrubeyê dike di sehneya dîrokê de hebûna kirdeyê wekî şert berpêş dike. Li gorî wî beyankirin, tecrûbeya bêdeng azad dike, ji rasterastîyê û jibîrkirinê xelas dike û wê dikare neqil bike ango bike ya *her kesî*⁶. Lêbelê temsîlîyeta bîra hevpar berî ku bibe ya *her kesî* rêya wê dikeve ber vegotin û bîranînên takekesî, ew kes kirasekî ku bi me nas tê li xwe dike, em li ser rastîyên wî/wê ji bîranînan ango çavkanîya bîrê sûdê werdigirin û dirûvekî didin nikaya xwe. Çimkî bîra ku hatîye tecrûbekirin xwe dispêre takekesan, serpêhatîyên wan û êşa wan, hetta dema ku ew, bîra hevpar, polîtîk û nîfşî di nav xwe de bihewîne ji rewş naguhere.⁷

Kurteçîrokên ku ez ê li jêr nîqaş bikim ji wêne, derbirîn, nimandin û serpêhatîyên jinên ermenan pêk tên, ku beşek ji bermayîyên dîroka me ya nêzik e, ya ku em vê axirîyê rûbarî hev dikevin da ku em bikaribin bîra xwe ya zîyanlêbûyî bi mebesta tamîreke vebêjî di wêjeyê de ava bikin. Ev rabêja ku dibe warê avakirina bîra hevpar, bi awayekî dîrok, bîr û wêjeyê digihîne hevdu û dibe *berdevkê civakê*.⁸

Kurteya Du Çîrokên Keçên Ermenîyan; *Bavfile* û *Zûra*

Çîroka berîn a ku em ê lê bikolin çîrokeke bi navê *Bavfileyê* ye ku di pirtûka *Mehkûm*⁹ a M. Alî K. de cih digire. Wekî ku mirov dikare ji sernavê çîrokê jî texmîn bike, vebêjer keseke ku bavê wê fileh e, di navenda vebêjê de bi cih kirîye. Ji destpêka vebêjê werê xuya dike ku pîreke heftê salî û nexweş ji zarokên malê dixwaze ku cihên wê li ber paceya odeya jorîn çêbikin û wê odeyê jî ji deng û qelebalixîyê xalî bikin. Pîrejin di vê odeyê de dikeve nav bîrewerîyên xwe yê zaroktîyê. Em ji vebêjê têdigihin ku ev pîrejina berî şêst salan, dema ku hê keçeke deh salî bûye, li gel cimaeta ermenîyan li dêrê beşdarî ayînekê bûye. Di wê ayîne de li ser dêrê de digirin û hemû kesên li hindirê dêrê de ne, bi singû û guleyan ve dikujin. Lê Marya ya ku di hembêza dîya xwe de ye, ji derbên singûyan tê parastin. Piştî demekê kalemêrek tê nava dêrê û destê wê digire û navê wê jê dipirse. Ew bi tirsê dibêje navê min Marya ye. Kalemêr ê

6 Beatriz Sarlo, *Geçmiş Zaman: Bellek Kültürü ve Özneye Dönüş Üzerine Bir Tartışma*, wer. Peral Bayaz Charum, Deniz Ekinci, İstanbul, Metis, 2010, r.21

7 Andreas Huyssen, *Present Pasts: Urban Palimpsests and Politics of Memory*, Stanford University Press, Stanford, 2003, r.110.

8 Bnr. Dawid Yeşilmen, “Di Romanên Kurdî de Avakirina Karakterên Ermen û Temsîla Wan”, *Wêje û Rexne*, h.2, sal.2014, Dîyarbakir, m.202-215.

9 M. Alî, K., *Mehkûm*, weş. Avesta, Stenbol, 2002.

ku ligel jina xwe dijî û tu zarokên wan nînin, navê wê diguherîne û dike Emîne. Emîne ligel kalemêr û pîrejinê weke keçeke misilman tê xweyî-kirin û heta temenê xwe yê zewacê Marya, bi navê xwe yê nû ve Emîne, ligel vê malbatê dijî. Pey re bi mêrekî misilman re dizewice û jê sê law û du keçên wê çêdibin. Ber bi dawîya emrê xwe wekî ku li jorê jî behs hate serê, di odeyê malê de bi tenê dimîne. Kurê wê yê ku naxwaze di saetên dawî yên dîya xwe de wê bi tenê bihêle jê dipirse bê ka xwestekeke wê heye an na. Emîne an jî bi navê xwe yê zaroktîyê ve Marya dibêje: “*Min bigire bibe dêrê! Ez dixwazim li dêrê metranekî bibînim!*”. Zarokên li malê lomeyan lê dikin û dibêjin dayîka me *xurîfîye*. Zarok biryarê didin ku biçin melayekî bibînin da ku li ser yasînan bixwîne lê heta mela tê Emîne rihê xwe teslîmê Xwedê dike. Dû re, kurê wî dibîne ku li ser sînga wê xaçeke biçûk û zêrîn heye û li ser MARYA nivîsandîye.

Çîroka me ya duyemîn çîroka keçeke ermenî ya bi navê *Zûrayê* ye, di kitêba kurteçîrokan a Felat Dilgeş a bi navê *Dilşayê*¹⁰ de cih digire. Ev çîrok jî serpêhatîya keçeke biçûk a bi navê *Zûrayê* vedibêje. Di çîroka *Zûrayê* de, pêkhatina bûyerê, navê gund û dîrokên ku tê de hatine aşkerakirin rayê me dide ku çîrok serpêhatîyêke rastîn vedibêje ango bûyer ne xeyalî ye. Jixwe jî çend çîrokên din ên di kitêba nivîskêr a bi navê *Dilşayê* jî bi rehetî tê derxistin ku nivîskar di vebêjê de ji paşxaneyê xwe û guhdarîya şahidîyên mezinên xwe ji xwe re kirîye malzeme û ew bi awayekî ji nû ve hilberandine. Herwisa, ev yeka jî ji angaştê *Özlem Galipê* re dibe palpişteke ku dibêje qismêke mezin a romanên kurdî yên ku bûyerên sala 1915an ji xwe re dikin mijar, xwe dispêrin rastîyan û ji serpêhatîyên takekesî yên nivîskaran sûtê werdigirin.¹¹

Çîrok, di sala 1915an de li gundê *Duderyayê* ya ku li ser navçeya *Pasûrê* ve ye dest pê dike. Wê salê pêde pêde gotinên derheqê kuştina ermenîyan de li dormala herêma *Pasûrê* belav dibin. Keşe û serekên ermenîyan tîna serdana muftîyê *Pasûrê Şêx Mihemedê Duderî* yê ku bi *dilrehmî*, zanatî û rastgobûna xwe, xwedan qedr û qîmet bûye û bi dehan murîdên wî hebûne. *Şêx Mihemedê Duderî* malovanîya keşe û malmezînan ermenîyan dike, behsa hevjinên kurd û ermenîyan dike û acizî û nerazîbûna xwe li hember fermanê tîne zimên.

Zêde dem ser de nabihure, gundê *Duderyayê* ne tê de, li her derê bi destê dewletê bûyerên kuştin, talan û sirgûnê her diçe belav dibin.

10 Felat Dilgeş, *Dilşa*, weş. Mîr, Stenbol, 2003.

11 Özlem Galip, “*The Politics of Remembering: Massacres against Non-Muslims in Kurdish Novelistic discourse*”, Hrant Dink Workshop (1-2 Hezîran 2013)

Di vebêjê de behsa çend bûyerên dilsoj tê kirin ku li gundên derdoran qewimîye. Şêx Mihemed hemû ermenîyên ku xwe davêjin ber bextê wî paşve venagerîne û wan tîne qedereke dirêj di malên gund de, di şikeftên derdora gund de vedişêre. Di nav wan kesan de kirîvê Şêx Mihemed Xerabetê Îsa û malbata wî jî hene. Rojekê wexta ku Şêx Mihemed li Pasûrê wekî miftî dixebite dewlet di ser gund de digire û hemû ermenîyan kom dike ku bibe. Şêx Mihemed bi hespê xwe digihîne gund û qaffileyê dibîne. Di nav de hemû kesan nas dike lê çavên xwe zêdetir li kirîvê xwe, li Xerabet digerîne. Xerabet xwe nêzikî şêx dike û dibêje: “Min Anoş li ba zarûkên we hişt”.

Xerabet ji bo ku tiştê neyê serê wê, keça xwe ya pêncsalî Anoşê, li mala Şêx Mihemed dihêle. Anoş piştî ku ferq dike dê û bavê wê, hemû xwişk û birayên wê çûne, bi şev û rojan digirî û zahf li ber xwe dikeve. Lêbelê malbat tu ferqê naxe navbera zarokên xwe û Anoşê. Rojekê, Şêx Mihemed gazî Anoşê dike û jê re dibêje ji vê şûnde navê te Zûra ye. Dema ku wextê wê yê zewacê tê Zûra bi dilê xwe, bi kurê Şêx Mihemedê bi navê Fehmî re dizewice. Neh zarokên wê û Fehmî çêdibin û wextekê bi malbatî wekî sirgûn diçine Aydinê. Di sala 1989an de, Zûra bi nexweşîyeke giran dikeve, ji pesnan xeber dide û navê xwişk û birayên xwe; Anoş, Aqûb, Mîsaq, Coyana û Meryemê dinehwirîne. Dema ku kurê wê Zûrayê dibe nexweşxaneyê li Stenbolê, doktor dibêje ku wê di biçûktîya xwe de şokeke pir mezin derbas kirîye, dibe ku tiştêkî xwe yê pir hêja winda kiribe, çimkî ji pesnan nava dibêje. Kurê wê çîroka dîya xwe ji doktor re dibêje û em ji doktor hîn dibin ku piraniya pîr û kalên ermenîyan ên ku ji fermanê filitîne ev nexweşî kişandîye. Kurê Zûrayê soz dide ku eger dîya wê pak bibe, dê bibe dêrê û bi ermenîyan re bide naskirin lêbelê dîya wê çavên xwe careke din venake.

Ji Paşxaneyê Dîrokî Ber Bi Dîroka Devkî û Edebîyata Çîrok-sazîyê

Wekî me li jorê jî gotin anî serê, hin çîrokên derbarê bûyerên 1915an de hatine nivîsîn xwe dispêrin rastîyê. Çîroka *Zûrayê* ya Felat Dilgeş¹² çîrokeke bi vî rengî ye, lewma eger merdim bi kurtasî be jî behsa lehengê çîroka bi navê Zûrayê, Şêx Mihemedê Duderî bike dê baş be. Çimkî bûyerên ku di çîrokê de derbas dibin bi temamî bi jîyana rastîn a Şêx Mihemed re li hev dike. Şêx Mihemedê Duderî zanayekî hezkirî û alimekî kurd

12 Nivîskar ji bo nivîsên xwe yên edebî *Felat Dilgeş* bi kar tîne lê navê wî yê rastîn *Abdullah Kiran* e ku bi vî navî jî tê naskirin.

bûye. Qedereke dirêj li Pasûrê (Qulp) miftîti kirîye. Dema ku komkujî dest pê dike ew li ser karê xwe yê fermî bûye. Herwiha ji xebatên dîroka devkî jî tê dîtin ku Şêx Mihemed di heman demê de derê xwe ji serhil-dêrên seyîdan û berazan re vekirîye.¹³ Şêx Mihemed di sala 1940-41an de dema ku li Aydinê li sirgûnîyê bûye, diçe ber rehma Xwedê. Xebatên qadî nîşan didin ku hê jî di nav gelê derdora Pasûr û Farqînê de, derbarê Şêx Mihemedê Duderî de tê gotin ku wî komkujî nepejirandîye û di xelasîya zarokên biçûk ên ermenîyan û misilmanbûna çend malbatên ermenî de rola wî hebûye.¹⁴ Wekî ku ji her kesî eyan e, xêrxwaz û dilbirehmên wekî Şêx Mihemedê Duderî ne kêman bûne. Hejmareke zêde ya ermenîyan bi destê rûspîyên kurdan ve hatine xelaskirin. Ji ber ku derveyî babeta me ye, hewce nake mirov li vir navên wan rêz bike. Zarokên ermenîyan ên ku li Kurdistanê mane bi piranî jî alîyên kurdan ve hatine xweyîkirin. Hê jî kêsên ku dapîra wan jî wan zarokên ermenîyên sêwî bûne, hene di nav kurdan de, bi taybetî jî di nav kurdên Dîyarbekir û Mêrdînê de. Jixwe derbarê vê rastîyê de pêdivî bi zanyariyên statîstîkî jî nîne, lewre em giş ji derdora xwe dibihîsin û dibin şahid. Bi gelemperî zarokên qîzî carinan jî yên kurîn jî alîyê kurd û tirkan ve hatine hildan û nav û dînen wan hatîne guhertin. Bêguman mirov nizane bê ka vê veqetîna wan a ji malbat, çand û milletê wan, bûye sebebê trawmayên bi çi rengî. Lêbelê ya ku em dibînin ji folklorê heta edebîyatê derheqê vê babetê de serpêhatîyên mezinên me hê jî tên neqîlkin. Bi guherîna civakê ve, wekî ku tê zanîn tabûyên derbarê ermenî û kêmaniyên din de tên şkestin, bi vî rengî jî derbarê bêdengî û tirsê de serpêhatîyên jinên ermenîyan yên rastî carinan di weşanên rojane de jî cih digirin.¹⁵

Dîroka devkî bi rêya kilamên dengbêjan û serpêhatîyên takekesan, derbarê komkujîyê de birrek tişt ji dewra me re hiştîye. Her çiqas wê demê hê bûyer tam dest pê nekiribin jî kilama ku li ser Gulê û Hecî Musa Beg hatîye gotin, navdartirîn kilam e ku êşa keçeke ermenî ya ku bi kotekî hatîye revandin, vedibêje. Dengbêjên kurd di kilamê de bûne alîgirê Gulê ango Gulîzerê û qezaya ku hatîye serê Gulê qebûl nekirine, li dijî vê yekê derketine û ev bûyera zordarîyê bi zimanekî gelek hunerî û delal

13 Bnr. Celadet Alî Bedirxan, "Biserhatîyên Çend Mirovên Seyîdxanê Kerr", *Çira*, h.4, Kanûna Pêşîn 1995, r.24.

14 Adnan Çelik, Namık Kemal Dinç, *Yüz Yıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Dîyarbekir*, r.249.

15 Taraf Gazetesi, "1915'i bir de ondan dinleyin... 'Annem ölene kadar korkudan ismini söyleyemedi', <http://www.taraf.com.tr/guncel-haber/1915i-birde-onun-agzindan-dinleyin-annem-olene-kadar-korkudan-ismini-soyleyemedi/> (24.04.2015)

protesto kirîne.¹⁶ Wekî ku ji nimûneyên folklorê jî tê dîtîn, li hember bûyerên ku pêk hatine, helwesta nerazîbûnê heye û ev helwesta ku hêza vegotina xwe ji serpêhatîyên rabirdûyê werdigire, di rabêja edebî de jî bi heman rengê nerazîbûnê xwe dide der. Ji bilî vê, di herdu çîrokên navborî de jî lehengên sereke wekî Gulê jin in û bi vî rengî çîrokan êşa jinê ji xwe re kirîye babet. Wekî ku tê zanîn di şer û pevçûnan de tehrîbata ku rû dide xwe digihîne her kesî lêbelê tehrîbata ku xwe digihîne beden û ruhê jin û zarokan ji ber xwezaya wan a nazik û rola wan a civakî zêdetir e. Çimkî di şer de ji ber ku mêr diçin şer û bi piranî li malbatên xwe venagerin, jin û zarok bê xwedî û xwedan dimînin û pêrgî serpêhatîyên trawmatîk ên wekî destdirêjîyê tên. Di vê xalê de, zarok bi trawmayeke diwartir re rûbirû dimînin çimkî ew ji werara hestî bêpar in û tecrubeya wan a jîyanê nîne ku tişteki ji trawmaya ku dijin beşer bikin.¹⁷

Herwiha, di vebêja çîrokan de wisa dixuye ku îdealîzekirina dîrokê wekî nîşaneyeke bêrîkirinê ye ku jîyana pêkve ya gelê kurd û ermenîyan dixê bîra me. Dema em demên borî bi bîr tînin, talûkeya dehîka daxwaz û nostaljiya îroyîn derdikeve pêşîya me; ev yek şeweyeke piştguhkirinê ye, carina ji rabirdûyê hin tiştên dilxweş dineqîne û hinekên din jî ji bîr dike an jî di cih de dihêle.

Di Nav Jinên Ermenîyan De *Peymana Bêdengîyê*

Di herdu çîrokan de jî bi awayekî balkêş li ser bêdengîya salan a jinên ermenîyan vegotîneke hevpar hatîye avakirin. Keçên ermenîyan ên ku ji mirinê filitîne û bi misilmanan re zewicîne derbarê serpêhatîyên xwe û rabirdûya xwe de dikevin bêdengîyê û heta ji destê wan tê derbarê serpêhatîyên xwe de xeber nadin. Bêdengîya ku bi hebûna xwe raza wan dihêvişîne, ya ku heta dinya xweş be bi lêqewimîyan re wekî kulekê di bîra kivil de tê sitirandin, ber bi dawîya emrê wan, di laşê li ber sikratê de xwe digihîne asteke wisa berz ku êdî wekî ku ev bedena ji zaroktîya xwe û vir ve bin barê bêdengîyê de ye, dixwaze azad bibe û bi hinceta ku sira xwe aşkera bike, vediciniqe.

Divê mirov di navbera komkujîya ermenîyan û Holokostê de çend ferqên sereke bîne zimên, çimkî di encama herdu komkujîyan de jî

16 Rohat Alakom, *1915 Komkujîya Ermenîyan*, r.42.

17 Brahm, E. (2004-2015). *Trauma healing*. University of Colorado, the Beyond Intractability Knowledge Base Project Web site: http://www.beyondintractability.org/essay/trauma_healing/ (23 .05.2015)

bêdengîya ecêb a ku li ser lêqewimîyan çêdibe, bala mirov dikişîne. Ev encama wêranker a hevpar, rêbaz û dînamîkên herdu komkujîyan nake yek. Newekhevîya di navbera wan de zêdetir bi sedemên kuştinê ve pêwendîdar in. Bozarslan negotî¹⁸, di Holokostê (*Şoah*) de, her çiqas sedemên kuştinê bingeha xwe ji dîn bigirin jî, zêdetir xwe bi safbûna xwîn û nijadê ve watedar dike û guhertina dîn nabe krîterek ji bo mirov li ser nijada aryan bê hesibandin. Lêbelê, di Împeratoriya Osmanî de her çiqas armanca sûcê giştî tunekirina yên din be jî, ne di vê armancê de ye ku vê yekê di asta takekesî de pêk bîne, tunekirina koma bawermenên din ango koma mesîhî-ermenî tê armanckirin.¹⁹ Pêkhatina komkujîyê ya ku bi ihtîdayê (ji dînekî din dagerîna ser dînê îslamê) ve rengê wê diguhere, dihêle ku kesên bûne misilman ji tehcîrê xelas bin û bi vî rengî jî ji mirinê bifilitin. Lewma mirov dikare bibêje ku diyardeya jinên ermenan cuda qewimîye û şerê ku desthilatdarîyê bi gelê ermenîyan re kirîye, bi heman rengî di nav gel de pêk nehatîye. Refleksên civakî yên li dijberî desthilatdarîyê pêk hatine, hiştîye ku keçên ermenîyan bîn xweyîkirin. Eger em ji vê bergehê lê binêrin, em ê bibinin ku komkujîya li ser ermenîyan pêk hatîye, ji ber xususîyetên xwe yên xweser dihêle ku em wê ji hin komkujîyên din cuda binirxînin. Helbet êş û karesata ku li ser keçên wan pêk hatine zaf rûxîner e, çimkî bi hezaran keçên ermenîyan wekî koleyan hatine firotin, rastî destdirêjîyê hatine û ji bêgavîyê bo ku ji mirinê xelas bibin, bûne misilman. Vê rastîyê jî bivê nevê trawmayeke nebînaî derxistîye holê.

Derheqê serdestîya bêdengîyê de xebata Yael Danieli divê bêbidefterkirin.²⁰ Danieli di çarçoveyê xebata qadî ya li ser mexdûrên Holokostê de dikeve wê ferqê ku ji mexdûran tu kes bawerîya xwe bi xebatkarên profesyonel ên tendurustîya derûnî naynin û di wê qenaetê de ne ku wê êşa wan guhdarî nekin an jî pê bawer nekin. Ew û pey re jî zarokên wan difikirin ku mirovên ku heman tişt tecrube nekirine nikarin fahm bikin an jî xema wan nîne. Bi vê xeyalîstîyê ve, lewma piranîya wan kesên mexdûr di têkilîyên xwe yên bi kesên ne-mexdûr re, di derheqê Holokostê û encama wê de, *bêdengîyê* hildibijêrin. Di encama wê de di navbera mexdûrên Holokostê û civakê de *peymana bêdengîyê*²¹ (conspiracy of

18 Negotî tê wateya “wekî ku gotîye, çawa ku anîye zimên”.

19 Hamit Bozarslan, “Bazı Karşılaştırma Unsurları: Ermeni ve Yahudilerin Yok Edilmesi”, *Kovara Birikimê*, h.193-194, sal.2005.

20 Bi defter kirin: tomarkirin, qeydkirin û nivîsîn.

21 Di vir de peyva *conspiracy* tê wateya peymana nepenî. Lewma, ya rast ew e ku mirov bêje *peymana bêdengîyê ya nepenî*.

silence) derdikeve holê.²² Ev bêdengîya balkêş bi qewlê Danieli *peymana bêdengîyê* pergala herî berbelav û bitesîr e bo neqilkirina trawmayê li ser hemû rehendan (*dimension*).²³

Di heman demê de, girêdana hestî, malbatî, civakî, berdewamîya bêdengîya wan mihafeze dike, dibe rêgirekî li pêşîya xeberdana wan, lewre êdî xwedîyê malbatekî ne û zar û zêçên wan hene. Heta mirina xwe ji ber tirsê di rabirdûya xwe de, newêrin hevpeymana ku bi civakê re çêkirine –qebûlkirina misilmanîyê, bibîrnanîna bûyerên bi wan re têkildar- xerab bikin û xwe *xerab* derxin. Lêbelê her ji ber çî sedeman be bêdengî nahêle ew derkevin fêraqetîyê û aşkeranekirina rastîyê bi demê re di bîra mexdûran de tehrîbatê çêdike. Çimkî her çiqas ziman nikaribe başbaş êşa kesê trawmatîk vebêje jî bo şikandina bêdengîyê her tim alava herî muhim e di destê mêxdûr de;

Piraniya zanînê bi zimên ve girêdayî ye —ne tenê zanîna me ya trawmayê ya bi rêya zimanê lêqewimî (*mexdûr*) tê bidestxistin; lê herwiha bi rêya têgihîştin û bibîranîna serpêhatîyên kesê lêqewimî formulakirina wan a di zimên de. Ji ber navbera zêde ya navbera trawma û kulturê de, mexdûr bi gelemperî nikarin kategorîyên hizr û peyvan bibînin da ku serpêhatîya xwe vebêjin. Çimkî, ne kultur ne jî serpêhatî ji bo dirûvandina kiryarên êrîşkarîya giştî vegotinekî dabîn nakin, lêqewimî nikarin trawmayê bînin li ser zar û zimên, ji xwe re jî tevayî.²⁴

Ziman an jî şiyana xeberdanê alava herî girîng e ku zanîna mexdûr ya derbarê trawmayê de beyan dike. Helbet nika hin mexdûran di nav malbata xwe de eger derfet dîtîbin, serpêhatîyên xwe anîne ziman. Feqet yên ku qet razên xwe aşkera nekirine jî carinan bi refleksên bêhemdê xwe bêdengîya xwe şikandine. Çimkî, carinan bûyerên ku li serê me cirîyaye bêyî ku ji îradeya me destûr bixwaze ji binhişê me derdikeve û li dema me ya nika vedigere. Ev veqer bi xwe re nîgaşên êşê jî tîne û me diêşîne. Paul Ricoeur dema ku rola trawmayê di bîra astengkirî de şirove dike wiha dibêje; “Trawma wexta ku neliberdest be jî hebûna xwe diparêze. (...) qadên mezin ên rabirdûyê yên ku hatine jibîrkin an jî me wekî

22 Yael Danieli, “Massive Trauma and the Healing Role of Reparative Justice”, *Journal of Traumatic Stress*, Vol. 22, No. 5, October 2009, r. 351.

23 Yael Danieli, hb., r. 351

24 Laub, Dori and Auerhahn, Nanette C., “Knowing and Not Knowing Massive Psychic Trauma: Forms of Traumatic Memory”, *International Journal of Psychoanalysis*, 74 (1993), 287-302

windakirî hesibandine dikarin vegerin.”²⁵ Ev vegera ku hatina wê ne di destê me de ye bi *hukmê rabirdûyê* li ser bîra tepeserkirî ya mirov xwe disepîne û di vebêjên herdu çîrokan de jî (*Zûra* û *Bavfile*) wekî aşkerabûna rastîya hindirîn a lehengan rola xwe dilîze.

Bêdengîya balkêş a navborî ne tenê di nav jinên ermenîyan de lêbelê bi gelemperî di nav hemû mexdûrên trawmayê de dibe regekî sereke ya jîyana zîyanlêbûyî. Sermeselê, mecbûrîyeta vegotina çîroka Holokostê ji aliyê bêimkanîya vegotinê ve tê astengkirin û ji ber vê yekê, bêdengîya derheqê rastîyê de bi gelemperî desthil dibe. Pîranîya mexdûrên ku di *Fortunoff Video Archiveyê* de pê re hevpeyvîn hatine kirin, ferq dikin ku teze (çil sal piştî bûyerê) dest bi prosesê dirêj a şahidîyê kirine.²⁶ Ya rast mexdûrên jin ên ermenî rastî qadeke fireh û ferah jî nehatine ku serborîyên xwe bi awayekî bi kesekî re parve bikin. Çimkî tu derfeteke bi vî rengî heta ku wan ji dinyayê koç kirin di nav civaka me de nebû mifteha çareserîya alozî û bêdengîya hindirîn. Tenê jinên ku ji bûyerê filitîne lê rastî êrîş û destdirêjî û deqandinê hatine serpêhatîyên xwe bi kêmkî be jîvegotine. Di nav wan de jî yên ku tercîha xwe li ser bêdengîyê dane ne bi hejmareke wisa kêmkî in ku em piştguh bikin û ev dîyardeya di belgefilma bi navê *Deqên Dapîra Min* de jî tiştêkî eyan e.²⁷ Dîsa li ser heman mijarê Dori Laub dibêje;

Tu kes di bêdengîyê de aramîyê nabîne, wexta ku ev bêdengî tercîha wan bi xwe be jî rewş naguhere. Di ser de jî, mexdûrê ku çîroka xwe venabêje dibe qurbanîyê bîreke deforme, ango, bîreke bi darê zorê “xerabîyeke derveyî” lê hatiye sepanandin a ku bi xeyalê re dibe sebebê têkoşîneke bêkeve. “Venegotin” ji berdewamiya zordariyê re xizmetê dike. Di bibîranîna bêdeng de bûyer her ku diçe deforme dibe û bi berbelavî jîyana rojane ya mexdûr diherimîne û dagir dike. Çîrokê çiqasî bêdeng dimîne, ewqas têgihîştina mexdûr a derbarê wê de deforme dibe, ev yekê tê radeyeke wisa ku mexdûr derbarê rastîbûna bûyerên pêkhatî de dikeve şik û şibhê.²⁸

25 Paul Ricoeur, *Hafiza, Tarih, Unutuş*, weş. Metis, 2012, r. 489.

26 Caruth, Cathy, “The Truth and Testimony The Process and The Struggle”, *Trauma: Explorations in memory*, Johns Hopkins University Press, Baltimore and London, 1995, r.64.

27 Di belgefilmê de dema ku hevpeyvîner ji jîneke pîr a mexdûr dipirse tu çima hemû çîrokê nabêjî, ew wiha bersivê dide: “-Ji bo Xwedê çira divê ez bibêjim tirkên wisa kir. Çîrokeke dirêj e. Bes em bibêjin zarokên wisa kirîye. Em vê li wir bihêlin”: Suzanne Khardalian, Grandma’s Tattoos :https://www.youtube.com/watch?v=bwj4e_f_1DI (25.05.2015)

28 Cathy Caruth, “The Truth and Testimony The Process and The Struggle”, *Trauma: Explorations in Memory* Johns Hopkins, r.64.

Piştî bêdengîyeke demdirêj a ku Laub wekî berdewamîya zordariyê dibîne têgihîştina derbarê rastîbûna bûyerê de jî xerab dibe. Gelo ev bûyer pêk hatibû an tenê dilwasî bû? Çimkî bêdengîya bi salan a derbarê bûyerê de dikare têkilîya bi dema borî re qut bike. Lêbelê carina navek, guharek, gustîlek, kolyeyek, têkilîya zeîf a bi serborîyan re xurt dike û dibe hişyarkerê ku bi daîmî mexdûr li rastîya wê vedigerîne. Di herdu kurteçîrokên navborî de jî yadîgarên ji dê û bavan mane, dibin tekane hevrazên keçên sêwî û ji birewerîya wan re derî vedikin. Lewma, bi raya min, alavên ku ji malbata wan dimînin (di çîrokên me de *xaça zêrîn* û *guhâr*) û wekî emanetê tên parastin, bi bûyera rabirdû ya ku hatiye li serê lêqewimî re berdewamîyekê diafirînin. Ev alavên ku bi hebûna xwe ve serdestîya bêdengîya li ser serpêhatî û bibîranîna tepeserkirî dişkîne û dema raborî bi dema nika ya mexdûran re dibestîne.

(...) Êdî Zûrayê dixwest ku her tiştî ji bîr bike. Xên ji guharekî, tu tiştek ji dê û bavê wê, ji xwişk û birayên wê di vê malê de tunebû. Çend meh berîya Fermânê, gava ku ew bi dîya xwe û bavê xwe re hatibûn Dûderyayê, dîya wê guharek xwe dîyarîyê bûka Şêx Mihemed kiribû. Ev guhar hergav di guhê bûka Şêx Mihemed de bû. Belê ne bûka Şêx Mihemed û ne jî tu mafîyekî nizanibû ku dayîna vî guharî tê bîra Zûra û ev guhar dîya wê bi bîra wê tîne.²⁹

Li Ber Sikratê Rûdana Rastîya Hindirîn

Xeberdan an jî rûdana li ser nivînê sikratê taybetmendîyeke balkêş a herdu kurteçîrokên navborî ne. Di herdu kurteçîrokan de jî ber bi mirina xwe lehengên sereke derbarê hest û bawerîyên xwe yê tepeserkirî de xeber didin û rastîya xwe ya hindirîn aşkera dikin. Ev vegotin xebata liser bîra civakî ya Çelik û Namik Kemal de jî başebaş xuya dike û em di vê xebatê de jî dibînin ku heman çîrokên li ber sikratê di nav gel de bi awayekî devkî hê jî berdest in.³⁰

Dema ku hafizeya meriv wekî alaveke derveyî îradeyê karê xwe yê adetî tomar dike, bi her çi rewşê re – stres, depresyon, arîşeyên xewê-rûbirû mabe wan li gorî radeya kartêkerî û girîngîyê li gel xwe diseniffîne û vedişêre. Hin bûyer, bîranîn an jî karesat di vê tomarkirinê de, cihên muhim dadigirin û eger bandora wan derûnîya mirov xerab kiribe, bivê nevē bi awayekî bêhemd ji paşxaneya xwe ya ku tê de wekî hêzeke nehênî radiweste, radibe û hukmê xwe yê fermanber li ser beden û hişê mirov

29 Felat Dilgeş, *Dilşa*, weş. Mîr, Stenbol, 2003, r. 106.

30 Adnan Çelik, Namik Kemal Dinç, *Yüz Yıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Dîyarbekir*, r.329-331.

ferz dike. Mirovê ku heta dereceyeke bilind di bin bandora bûyereke xerab de mabe û derûnîya wê têk çûbe bi qewlê Cathy bêhemdê xwe dikeve li ber *hukmê rabirdûyê*. Wekî mînak di çîroka *Bavfile* de serleheng Emîne di saetên xwe yê dawî de li lawê xwe yê mezin dimeyzîne û jê re dibêje: “Min bigire bibe dêrê! Ez dixwazim li dêrê metranekî bibînim!”³¹ Kurê wê li ser vê gotina dîya xwe ecêbmayî dimîne û ji malbatê re dibêje: “Dîya me xurufîye”³² Pey re diçe gazî mele dike da ku li ser yasînan bixwîne lê heta mele tê dîya wî rihê xwe teslîmê Xwedê dike;

Dema mela çûbû, lawê wê xwestibû laşê dîya xwe rast bike. Gava destê wê yê girtî ji ser sînga wê bilind kiribû, bi ecêbmayî, çavên wî bi xaçeke piçûk û zêrîn ketibû ku dibiriqî, rahiştibû xaçê, nêzîkî çavên xwe kiribû, bi behîtmayî nivîsa li ser xwendibû; *MARYA*.³³

Carina ew kesên ku em arîşeyên wan ên hestî bi sifetên wekî *şêt*, *dîn* û *ewter* ve dinavînin, di rastîya xwe de ji daxwaza bîr û bedena xwe û pê ve tu tiştêkî cuda pêk naynin. Dema ku Emîne ango bi navê xwe yê kevn Marya ber bi mirina xwe dixwaze ku wê bibin dêrê lawê wê dîya xwe tawanbar dike. Keçên ermenîyan ber bi dawîya emrê xwe êdî di bin barê trawmayê de diçin ber emanê û êdî nikarin bibin hilgirê barê giran. Lêbelê ber bi dawîya emrê xwe jî bo firaqetîya canê xwe, guhdarekî peyda nakin ku jê re ya di dil de veşartî vebêjin.

Encam

Ji berê de derbarê êş û karesatan de hewcedarîya mirovahîyê bi vegotin û parvekirinê heye. Edebîyat û huner jî çavên xwe ji êşên mirovahîyê re nagirin û ji bo “daxwaza vegotinê” ya karesatan, biçûk be jî qadekê terxan dikin. Ev qada bi şahidî, bîranîn, hemhestîyan ve dagirtî, êşên rabirdûyê bi bîra me dixê û wan ji windabûnê rizgar dike. Çimkî jibîrkin an jî piştguhkirin arîşeya di bîra me de çareser nake. Ji bo tamîrkin û pakkirina bîra me ya civakî hewceyî bi vegotinên bi vî rengî hene. Heta em bi dîroka xwe ya nêzîk re hevrû nebin û vê dîrokê bi rastbînî di bîra xwe ya îroyîn de bi cih nekin, em nikarin êşa kesên mexdûr bibirin.

Di nav jinên ermenîyan de, ji bo hemû kesan nebe jî, li ser bêdengîyê lihevkirineke giştî heye. Ev lihevkirina li ser bêdengîyê ya ku wekî *peyman* *bêdengîyê* tê binavkirin, ji Holokostê heta jinên ermenîyan li

31 M. Alî, K., *Mehkûm*, r.37.

32 M. Alî, K., h.b., r.37.

33 M. Alî, K., h.b., r.38.

ser piranîya lêqewimîyan hukmê xwe li dar dixê. Bo şikandina vê serdestîya bêdengîyê ya ku di bîra me de cih girtiye, pêdivî bi beyankirin û xeberdanê heye. Çimkî dema ku mexdûr çîroka xwe nebêje zordarîya ku li ser îradeyê hatîye sepandin têk naçe û bêdengî bîrê zêdetir deforme dike. Çîroknûsîya kurmancî êşa jinên ermenîyan ji bîr nekirîye, govanî li rabirdûya xwe ya nêzik kirîye û bi vî rengî jî bi hêza vegotinê re ya ku bîra me ya deforme pak dike, ji êş û felaketa lêqewimîyan re dibe zar û ziman.

Çavkanî:

- Alakom, Rohat, *1915 Komkujîya Ermenîyan*, weş. Avesta, Stenbol, 2015.
- Bedirxan, Celadet Alî, “Biserhatîyên Çend Mirovên Seyîdxanê Kerr”, *Çira*, h.4, s. Kanûna Pêşîn 1995.
- Brahm, E. (2004-2015). “*Trauma healing*. University of Colorado, the Beyond Intractability Knowledge Base Project Web site: http://www.beyondintractability.org/essay/trauma_healing/ (25.05.2015)
- Bozarşlan, Hamit, “Bazî Karşılaştırma Unsurları: Ermeni ve Yahudilerin Yok Edilmesi”, *Kovara Birikimê*, h.193-194, sal.2005.
- Caruth, Cathy, *Trauma: Explorations in memory*, Johns Hopkins University Press, Baltimore and London, 1995.
- Çelik, Adnan, “Hafıza Rejiminde yeni bir alan: 1915, Kürtler ve edebiyat”, *Kovara Birikimê*, h.27, sal.2015.
- Çelik, Adnan, Dinç, Namık Kemal, *Yüz Yıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Diyarbakir*, İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları, 2015, r.329-331.
- Danieli, Yael, “Massive Trauma and the Healing Role of Reparative Justice”, *Journal of Traumatic Stress*, Vol. 22, No. 5, October 2009
- Galip, Özlem, “*The Politics of Remembering: Massacres against Non-Muslims in Kurdish Novelistic discourse*”, Hrant Dink Workshop (1-2 Hezîran 2013)
- Huyssen, Andreas, *Present Pasts: Urban Palimpsests and Politics of Memory*, Standford University Press, Standford, 2003.
- Laub, Dori, and Auerhahn, Nanette C., “Knowing and Not Knowing Massive Psychic Trauma: Forms of Traumatic Memory”, *International Journal of Psychoanalysis*, 74, (1993), r. 287-302.
- Ricoeur, Paul, *Hafıza, Tarih, Unutuş*, wer. Mehmet Emin Özcan, Metis, İstanbul, 2012.
- Taraf Gazetesi, “1915’i bir de ondan dinleyin... ‘Annem ölene kadar korkudan ismini söyleyemedi’”, <http://www.taraf.com.tr/guncel-haber/1915i-birde-onun-agzindan-dinleyin-annem-olene-kadar-korkudan-ismini-soyleyemedi/> (24.04.2015)
- Vickroy, Laurie. *Trauma and Survival in Contemporary Fiction*. Virginia: The University of Virginia Press, 2002.
- Yeşilmen, Dawid. “Di Romanên Kurdî de Avakirina Karakterên Ermen û Temsîla Wan”, *Wêje û Rexne*, h.2, sal. 2014, Diyarbakir, 202-215.